



Information om
anhörigstöd på
kurmanji.

Ma tu jî piştgiriya hîn kesan dikî?

Me haluamme tukea sinua!

Ji bo te ger tu li kesekî nêz dinêrî

Ma kesekî nêzî te heye ku, çî kal û pîr, çî cîwan, ji ber nexweşî, ji ber bikaranîna maddeyên heşbir, seqetiya fîzîkî an jî ya derûnî muhtacî lênêrînê be?

Kesê tu lêdinêrî dikare ji malbatê be, xizmek, cîranek an jî dostek be.

Wekî xizmekî rola te girîng e û xizmetê tu dikî giranbuha ye! Lê hîn caran pêwistiya te jî bi piştgiriya heye.

Karê me bi qanûna xizmetguzariya civakî beşa % an û benda 5 kap 10\$ ve girêdayî ye:

"Desteya xizmetê karên civakî dê piştgiriya bide ji bo ku şerd û mercên kesên ku li xizmên xwe yên ji ber nexweşiyên demdirêj an jî kal û pîr in, an jî seqet in muhtacê lênêrînê ne."

Di van malperan de dikarî zêdetir agahdarî bistînin di derbarî piştgiriya lênêrîna xizman de:

www.goteborg.se

www.socialstyrelsen.se

Dixwazî di derbarî rewşa xwe de bi hîn kesan re biaxifî?

Li şaredariya Göteborg kesên bi alîkarîdayîna xizman re kar dikin hene. Tu dikarî berê xwe bidî wan ji bo ku agahdarî, amojgerî û alîkariyê bistînî. Alîkariya ji bo xizman dikare weke axaftina bi rêya telefonê bê dayîn û her wekî din weke perwerdedayîn, weke semîner, damezirandina komên xizman an jî weke alîkariya bo têkiliya ligel saziyên dadmendiye be. Ger pêwîstiya te bi wergerî hebe emê hîngê ji bo te werger biwesînin. Tu weke kesê alîkarî dide û ew kesê alîkarî jê re tê dayîn dikare li ser navê xwe daxwaza vê alîkariyê li ba servîsa civakî ya xizmetguzariyê bikin. Ev alîkarî dikare nobedariya li malê be. Ev yêk weke mînak, dikare çalakiyên rojane bin an jî dikare xebateke din be. Alîkarî divê li gorî şertûmercên takekesan be.



Bi xêr bên û têkiliyê bi şewirmendekî xizman re dêynin

Zêdetir agahdarî diderbarî alîkarîdayîna xizman û şewaza alîkariyên din de dikarî ji ba şewirmendên xizman peyda bikî.

Telefon: 031-365 00 00 Navenda Têkîlîdanînê

Ger tu alîkarî didî kesekî di jêr 65 salan re hîngê pirsax şewirmend li şaredariya Göteborg bike. Û ger ku alîkariya kesekî di jor salên 65 re bikî hîngê jî pirsax şewirmend li herêma tu lê dimînin an jî kesê tu jê re dibî alîkar lê dimîne bike. Tu dikarî koda QR a li jêr bidî xwendin an jî bikevî malpera www.goteborg.se/anhorigstodnaradig ji bo ku di derbarî xizmetdayîna xizman de zêdetir agahdarî bixwînin. "Xizm" hîlbijêre da ku adahdariyên têkîlîdanînê di derbarî şewirmendan de peyda bikî.



Peywendiya min
